

LENIN
SÊKANÎÛSÊ
PÊKHATINÊN
MARXISTIYÊ

LI BLAVKIRNÊN PARTÎ DÎMUKRATÎ
KURDISTAN (QIYADA MWEQET)
LIQÊ EWRUPA

WERGER SORO

BERLIN SALA 1977 DE

P Ê Ş G O T I N A W E R G Ê R

Xwendevanên Hêja!

Vaye ez vê pirtûka han "Sê Kanî û Sê Pêkhatinên Marxistyê" a Lenin, bi Zimanê Kurdî-Zaravayê Kurmancî- datinim ber destên we.

Ez bi erk û karekî li ser xwe dibînim ku ji dil û can hêviya dilovanyê û lêbuhurandinê ji Xwendevan û Rexnevanên xwe bixwazin, li ser van kûr û kêniyên ku di vê wergerê de bêtin peyda kirin. Ez dê pir dilsad û bextiyar bim ku carekê bi destên Rexnevanan wergerandineke çaktir û bi rêk û pêktir derkeve. Belê Werger li van kûr û kêmaniyan wirya ye, lê bi rastî, divê ~~li vir~~ bê te gotin, ku bes evayabû ji destê min dihat, li gora zanebûn û bextê min. Ez di wê bîr û baweriyê de me, ku pêşvexistina Zimanê me yekek ji karê binge-hî ku ew her û her li ser me ye. Tanî firo Bav Kalên me di vî warê han de pir kêmasî kirine. Em Nîfsê neha divê li ser me her roj û sev pêşvebirina Zimanê xweyî sêrîn û xweş li ber dilê me, pêşvexistin, bighînin zimanê Dunyayê ên bi pêşketî. Pêşketina Zimanekî yan jî li paşvemayî, wî ew bi xwe nîsan û mirêka pêşketin yan jî li paşvemayîna wî Miletî bi xwe ye.

Belkî ev karê hanî biçûk bibe palpêdaneke sivik ji bona pêşvexistina Zimanê me û a hêjî bêtir ji bona belavkirina ~~belavkirina~~ Bîr û Baweriyên Marxistyê-Leninistyê di nava Civaka me de, belê di nava Kurdistana me de.

Piştî herifandina Şûreşa Kurdî Borcuwaziyî mezin, Mêjûyî careke din bi darê zorê, bi hêz û hinera pêşveçûna qanûnên Jinê li ser tevaya Dilsoz û Welatperwerên Kurd zor dike, ku ew ji xwe bipirsîn, Cima weha hate Serê me? Xebata me divê ji bo kê be?

Xanî bêtir ji sêsed salî ev pirsên han ji xwe kirin û di pêşgotina Mem û Zîn dibêje: Amma ji ezel Xwedê wisakir ev Rom û Ecem di ser me rakir?

Ez mame di hikmeta Xwedê da Kurmanc di Dewleta Dinê da!

Aya bi çî wehî mane mehrûm bil cumle ji bo çî bûne mehkûm?

Her wehî Xaniyê Hozan pişt re bi ew perê zanebûn û huşyarî li gora dema xwe, tevaya pirsên dihatin kirin li ser pirsîyariya Kurd bersev dikir û hêjî bêtir Hozanê me dûr didît, bê ka divê xebata Kurd ji bona kê be. Di pêşgotina nû buhar de dibêje ev karê han:

Ne ji bo sahibê rewacan belkî ji bo Biçûkên Kurmancan.

Belê, li gora bersevan li ser wan pirsên jorî, zenabûn û şiyarbûna meyî Çînî, evindarî û dilsoziya me ji bona Welat û Civaka me tê diyar kirin, belê bi eşkerebûn derdixe magelo em dixwzin ji Borcuwaziya xwe, peyatiyê bikin yan jî ji Miletê xwe/xêbatê bikin, belê ji bona Gelemperiya Miletê xwe, ji bona Karker û Cotkarên xwe re? Belê firo evaya pirsê bingehî ku ji me tê kirin û her û her bersev ji me tê li ser xwestin.

Herifandin û hilwesandina Şûresa Kurdî Borcuwaziyî mezin ji me re da xuyanî û diyankirînrastiya gotina Lenin a dibêje, Ku Borcuwazî amadeye wî werisî bifroşe, ê ew pê tê darvekirin. Tevaya vê bîr û baweriyê bi carekê li ser Borcuwaziya meyî Kurd a Gen û genî tev tê bi cihanîn. Borcuwaziya me mîna hemû Borcuwaziyên Dunyayê dê her û her vî karê han beramberî xebata welat û Miletê me bike. Dê ew her û her bigere li geştê xwe, dê ew her û her bigerê li simsariya xwe, dê ew her û her bikoje hestiyên li ser sifra dujminê me, dê ew her û her dagire bêrik, paxil, kase û kontên xwe li ser kîsê Xwîna bi hezaran ji bastirîn û çaktirîn Gencên Kurdîstana me.

Çawa Rola Derebegyê di xebata meyî Milî de bi hinera pêşveçûna qanûnên jînê hatin dawî kirin û Çiqasî wan dixwest bi xebatê rabin, ketinên Miletê me di Rêberiya wan de her û her gewre tîrbûn û Destanên wî her û her mezin tîrbûn. Weha jî rola Mêjûyî a Borcuwaziya meyî Gen û Genî di Rêberiya azadiya meyî Milî de bi carekê hatiye dawî kirin bi herifandina Şûreşa wêyî mezin. Xebata me divê bes û bi tenê ji bona Gelemperya Miletê me be, ji bona Hejar û Perîşanên me be, belê ji bona Karker û Cotkarên me be. Ev jî bi çûna li ser Rêya Marxistîyê -Lenîstîyê, li ser vê Rêya rast û bi hêz û hiner ji bona guhertina Cîhana kevîna, a li ser zordaryê, sitem û çewisandina mirov di rêya mirov de pêkhatiye, belê ji bona pêkanîna Civaka Komonîstîyê sade ji zordaryê û çewisandina mirov di rêya mirov de.

Bê çûn li ser Rêya Marxistîyê-Lînistîyê Xebata Kurd ji bona Gelemperiya Kurd ew di pêşveçûna xwe de her û her bê bere, lêbelê ji bona Borcuwaziyê meyî Gen û Genî ew her û her pir bi dohn û zor bi bere. Çiqasî Lawên Kurdîstan li ber vê rastiya han kevîna, weha deha ew gorîyên azadiyê, serxwebûn û xweşbûna jînê kêmdikin û dema gihandina wan ermancan kurt dikin. Çûn li ser Rêya Marxîzîm-Lenîzîm li ser her yekî ji me şev û roj pêwîst dike tevaya Danînan Marxistîyê hûr û kûr bixwînin, liberkevin û tevaya dorhêla xwe bi carekê li ser van Bîr û Baweriyên bilind şiyarbikin û wan liberxînin. Çiqasî Komên Xelkên Kurdîstanê di van Bîr û Bawerîyan de bighên liberkevin û li ser herin, weha deha ew bi hêz û hiner dibin ji bona guhertina jîna xwe di azdyê, serxwebûn û xweşbûna jînê de, weha deha ew dûr dibin ji Evsan û Efyûna Oldaryê. Berzîkirin û bilindkirina ala Marxîzîm-Lenîzîm, ala sor, belê ala Komonîstîyê di nava Civaka me de, bi xweşî, Hêvî û Mirovanya me û a Nîfsên tînan bi xwe ye.

B E R L I N , di 31 tebaxê (awgost) sala 1977 de

S O R O

S Ê K A N Î Û S Ê P Ê K H A T I N Ê N
M A R X I S T Y Ê

Rêya Marx di tevaya Cihana Bajêrtiyê de beramberi xurt tirin dujmayeti û kîne dibe li nik zanistiya Borcuwazi çî a resmî yanji a liberalî, jiber ew di Marxisyê de "Rêçeke ziyar" dibîne. Bîr û baweriyeye din mero jê nikare hêvi bike, jiber zanistiyeke Civakî "Bêbenditî" di Civakeke bingehkiri liser xebata Çinitî nikare bête ditin. Bi vî rengî yan ê din, TEVAYA zanistiya Resmî yaxud Liberalî LIBER kirya koletî DIDIN, di wê çaxa ku Marxistyê cengeke xurt li ser wê koletiyê rakirye. Çavderî ji zanistiyeke bê benditî di Civakeke pêkhatiyê li ser kirya koletiyê, dê ew bi xwe xavtirin dîmbûn be, weke nala hêvîkirinê ji Çêkirvanekî bê benditî kirin li ser pîrsa a ku kirya Karkeran divê bête bilindkirin, di dema mero qazanca sermîyam kêmîdike.

Bele ev nebes bi tenha xwe ye. Mêjuwa felsefê û mêjuwa zanistiya civakî bi hemû eskerebûn dide xuyanîkirin, ku Marxistî bi hîç têgihîştinekê naşibe "Bîtenaxwebûnê", ku ew rêyeye hîşkî li ser xwe hatiye tewandin, dûr ji rêya bilind a pêşketina bajêrtiya cihanî jê hatiye pêkhatin. Bi bermeqlubî: Tevaya hozanya Marx bi rastî pêktê, ku wî li ser wan pîrsan bersevdan, ên remana Mirovanya Pêşverû ji berê de ew kiribûn. Rêya wîna peydabû nala li duçûna rast û xweser a rêyên mezintirîn Nêwerên felsefê, ên abûriyên siyasî û ên sosyalistiyê.

Rêya Marx pîr bi hêz û hinere, ji ber ew raste. Ew di xwe de girtiye û lihavhatiyê, ew yekîtîke têgihîştina du'yayê dide Mirovan, a ku hîç xwe tu regekî lihev nayê yekekê ji evsan, bi yekekê ji kevneperestyê, bi yekekê li liberdana koletiyekê ji ên Borcuwazyê. Ew Dunde dawîyî ên bastrî tîştên ku Mirovanyê di sedsalên nozdehan de afirand: Felsefa Elemanî, Aburiya siyasîyî Ingilîzî û Sosyalistiya Firensî.

Li ser van hersê kaniyan û bi xwe jî di dema ku hersê pêkhatinên Marxistiyê ne, em di xwazin bi kurtî li ser wan herin.

I

Felsefa Marxistiyê METIRYALISTIYE. Di seranserya mêjuwa ewropayî nuh de û nemaze di dawîya sedsalên hijdehan de li Firensa, ku liwêderê gerekî man û nemanê dijî hemû gemariya sedsalên Navîn, dijî Derebegyê di damezgeran de û di remanan de dihate kirin, metiryalisti bi tenha xwe felsefê yekgirtî bû, lehevhatî bû tanî dawî, a ji bona tevaya têgihîştina rêyên zanistiyên serûştîyê dilsoz dima û dujminîya her evsan û qeşqûna qelp bû, h.d... Dujminên Demokratîyê ji ber vê yekê bi hemû hêz û hinerên xwe ve xerfkbûn, metiryalistiyê "nerastiya wê derxînin" bi gorbîkin û derewa li ser bikin, wan bi hemû regekî ji rengên felsefa nimûnetyê, a wan li berdidan, bi vî rengî yaxud ê din li ber ol didan yajî yarmetîya wî diki

rin.

Marx û Engels bi hemû xurtbûnekê liber metiryalistiya felsefi didan û bi bêjimardan xuyanikirin, bê çawan ji kokê de saxe her derketinek ji vî bingehî. Bi eşkeretirîn û bi firehtirîn wan di Danînên Engels de "Ludwig Feuerbach" û "Anti-Dührin" hatine danîn, ên -wek nala "Kommunistische Manifest" nivîstokên destên her Karkerekî şiyarî Çînî ne.

Lêbelê Marx ranewestiya li nik Metiryalistiya sedsalên hijdehan, wî felsefe bêtir bi pêsvexist. Wî ew dewlemend kir di rêya bidestketinên felsefa Elemanîyî kilasîkî û nemaze bi destketinên sustêma Hegel, a ji aliye xwe de bire ser Metiryalistiya Feuerbach. Giringtirîn ji van bi destketinan Diyaliktike, yani rêya pêsketinê di bastrîn şeklê xwe de, di xurt tirîn kurbûna xwe de, di dûrtirîn ji tengiya dîtina xwe de. Yani tiyoriya pêsketinê di pêsketitirîn û kurtirîn û bêtirtirîn liberketina şeklê wê de, tiyoriya rêlativîtêta zanebûna Mirovanyê a metiryê di pêsvêcûna xwe de her û her mirêk dike. Nuhtirîn dizandinên zanistiya seruştî- Radiom, Elektironên, guheztina perçan- bi xurtî bicihkirin rastiya Metiryalistiya Marx, tevî tiyoriyên Feylesufên Borcuwazî li gel her û her vegerandina wanî "nuh" a kevî û geniyî idialisme.

Marx Metiryalistiya felsefî kurkir û bi pêsvexist û ew gihande dawîya wê û berê wê firehkir ji zanebûna seruştîyê ji bona zanebûna CIVAKA MIROVANYÊ. METIRYALISTIYA MÊJUYÎ a Marx bidestketineke gewreyî mezinbû a remana zanistîyê bû. Liser tevlihevbûn û serberdaybûnê ku tanî wê demê serdarbûn li ser têgihîştina siyasî û mêjuwê de, tiyoriyeke zanistîyî pir baş lihavhatî, wekhev û hevgirtî dewsa wê girt, a ku dide xuyanikirin, bê çawan ji şeweyekî ji a jîna civakê, nala havilê gewrebûna hêzên berkirinê, formekî din, bilintir tê bi pêsvexistin - wek jibona nimûne ji Derebegyê bê çawan Sermiyandarî tê derdikeve.

Wehajî bê çawan zanebûna Mirov mirêk dike seruştîya heye bi rengekî azad ji wî, yanî metiryê xwe bi pêsvêdixine, weha ZANEBÛNA Mirovê CIVAKÎ mirêk dike (yanî cudabûnên bîr û bawerîyan û rêyên felsefî, oldarî û siyasî, hd.), mirêk dike PEHATINÊ ABURIYÎ civakî. Avaniyên siyasî radibin nala avaniyêk jor li ser bingehê aburî. Em jibona nimûne dibinin, bê çawan formên siyasîyî cuda ên dewletên Ewropayî niha ew xizmetê dikin ji bona serdariya Borcuwazyê li ser Pirolitarya xurtbikin.

Felsefa Marx ew metiryalistiya felsefîye a hatiye dawîkirin, a da Mirovan- û nemaze Çîniya Karker - destikên xurt ên zanebûnê.

II

Piştî Marx naskir ku sustêma aburî bingeh pêktine, a liser wê avaniya jorî siyasî têtê avakirin, wî pir guhpêdana xwe da Xwendîna vê sustêma aburî. Nivîstoka giringtirîn a Marx "Sermiyan" tev de hatiye danîn ji bona lêvenerandina

sustêma aburyê di civaka nuh de,yani a Sermiyandarî de.

Aburiya siyasiyî kilasikî beri Marx li Ingilistanê peydabû,ew welatê sermiyandar ku bêtirîn pêsketibû.Adam Smith û David Ricardo,ên li sustêma aburî vednerîn, wan bingehê pêsi ji bona TIYORIYA HÊJABÛNA KAR danf.Marx karê wan bire bi pêş de Wî ev tiyoriyâ han rast bingehkirî û wî ew rast û durust bi pêşvexist.Wî daxuyanikirin,ku hêjabûna her malekî di rêya koma dema karê pêwist ê civakî têtê danîn,ê pêwiste ji bona berkirina mal.

Di dema ku Aburvanên Borcuwazî pêwendî di nava tîstan de didftin(Guhertina Malekî di ê din),li wir Marx daxuyanikirin PÊWENDIYÊN DI NABERA MIROVAN DE.Bi hevguhertina mal derdixe pêwendiya di navbera Berkirvanên teka teka de di rêya bazarê de.PERE didin xuyanikirin,ku ev pêwendiya han her û her dê bête xurtkirin û tevaya jîndariya aburî a Berkirvanên teka teka dike yekbûneke bihevgiirtî.Sermiyan dide xuyanikirin:Pêsketineke bêtir a vê pêwendiyê:Hêza kar a Mirov dibe malîKarkerê bikirê hêza karê xwe difroşe Xwediyê erd,Xwediyê karxanê û Xwediyên destikên berkirinê.Perçakî ji roja kar bi kartîne,ku xerciya wî û a mala wî derdixîne(kirya kar),perçê din ji roja kar belê ew belaş kardike;ew HÊJABÛNA BÊTIR ji bona Sermiyandaran peyda dike,kaniya qazancê,kaniya dewlemendbûna Çfniya Sermiyandar.

Tiyoriya hêjabûna bêtir sitûna bingehî a tiyoriya aburiyî Marx.pêktine.

Ev sermiyanê di rêya karê Karker de hatiye peydakirin,zordariyê li Karker dike,wêran dike Xwedîmalên biçûk û Laşkerekî ji Karkeran durust dike.Di çêkirinê de biserketina çêkirina gewre di dîtina pêsi de diyare,lêbelê ji di çandinyê de em xuyaniyeke wek wê dibînin:Biserketina wargehên çandinyê ên sermiyandaryê gewre dibin,bi karanîna mekînan bêtirdibin,aburiya Gundiyan dikeve dehfên sermiyanê pere,ew berjêrdibin,wêranî pêdikevin di bin giranbûna paşvemayîna wêyî teknîkî de.Şeweyê vê berjêrbûnê di berkirina biçûk de cudaye ji a çêkirinê,lêbelê ev berjêrbûna han bi xwe rastiyeke ku liser nayête axivtin.

Di rêya herifandina berkirina bi-çûk de sermiyan kêrdike bi bêtirbûna berkirina kar û vejandina cihekî monopol ji bona civatên Sermiyandarên mezin re.Berkirin bi xwe dê her û her bêtir bibe berkirina civakî.Bi hezaran û milyonan ji Karkeran têtin komkirin di rêxistineke aburiyî pilankirî,berê karê bihev re lêbelê werdigrin ji xwe re lepek ji Sermiyandaran.Xurt tir dibe tevlihevbûna berkirinê,tengayî ûbi dûketina dînitî li dû bazaran û negirakirina jiyanê ji bona gelemper ya Xelkê.

Bi Rêxistina sermiyandarî bêtir dike girêdana Karkeran beramberî sermiyan û pêre jî di afirîne hêz û hinera karê bihevre ê mezin.

Ji destpêkirina aburiya mal,ji hêsantirîn bihevguhertinê,Marx da dû pêşvexistina sermiyandaryê tanî berztirîn rengê wê,tanî berkirina mezin.

Û serpehatya hemû welatên sermiyandar,çi ên kevin û çi ên nuh bi eşkerebûn didin

xuyanikirin sal bi sal bi gewrebûna jimara Karkeran û bi rastiya Rêya Marx. Sermiyandarî di seranserya cihanê de biserket, lêbelê ev bi serketina han nêr-dewaneke pêsiyê ji bona biserketina kar li ser sermiyan.

III

Gava Derebegî hate herifandin û gava sermiyandarê "Azad" hate dunyayê, xweser xwe da xuyanikirin, ku ev azadiya han sustêmeke nuhî zordaryê û çewisandinê a Îskeran bi xwe ye. Pêrejî hatin rêyên sosyalistiyên cuda, nala mirêk kirina vê zordaryê û nala pirotestê dijî wê. Belê sosyalistiya pêsiya pêşî sozialistiyeke otopîbû. Wê rexne li civaka sermiyandaryê digirt, wê ew vedgerand û nifir lêdiki-
rin; xwehdikir wê bi hilweşandina wê, bi ber çavên wê diket sustêmeke bastir û kardikir ji bona razîkirina Dewlemendan bi nesincbûna çewisandinê.

Lêbelê Sosyalistiya Otopî nikaribû deryekî derketinê ê rast û durust nîşanbîke. Wê nedikarî seruştiya kirya koletiya Sermiyandaryê bide xuyanikirin, ne jî dikaribû qanûnên pêşketina Sermiyandaryê bidoze, ne jî dikaribû bidîta HÊZA CIVAKÎ, a dikaribû biba Xudanê civaka nuh.

Jiber vê sûreşên bahoz ên dan tengala ketina windabûna Derebegyê, Peyştîyê li tevaya Ewropa û nemaze li Firensa, bi eşkerebûn her û her da xuyanikirin ku XEBATA ÇÎNÎ nala bingehê tevaya pêşketinê ye û mîna hinera wêyî tevgerê ye.

Hîç bi serketineke azadyî siyasî bi ser çîniya Derebegyê neketiye bêyî liberxwedaneke bêhêvî. Ne yek ji welatên sermiyandarî rabû li ser bingehêkî azad, demokrasî, tanî vî sînorî yaxud ê din, bêyî ku li ser man û nemanê di navbera çîniyên cuda de yên civaka sermiyandaryê de hatin dîtin.

Hozanbûna Marx têdîtin, ku wî berî ên din liberket, ji wan encaman wergire û rep û rast bi pêşvexine, a mêjuwa cihanê me fêr dike. Ev encamkirina han bi xwe rêya XEBATA ÇÎNÎ YE.

Xelk di siyasîetê de her û her gorîbûn ji bona xapandin û xwe xapandin, ew dê her û her wehaji bîmînin, tanî ku ew fêrnebin, pere hilanin li ser KARA vançîniyan yaxud ên din di pişt têgihîştinan de, daxuyaniyan de, sozên sincî, oldarî, siyasî û civakî de. Hevalbendên guhertinan û xweşkirinan dê her û her ji ên liberxwedanên kevnaryê bêtin zalkirin, tanî ku ew libernekevin, ku her avaniyeke kevin, çiqasî jî ew gemarî û pûç bête xuyanikirin, di rêya hinera vê yaxud her Çîneke Serdar de tête berdan. Da bikaribin liberxwedana van Çîniyan bişkinin, BES BI TEHA^N XWE YEKÇARE HEYE: Di nava wê civaka dorhêla xwe de bi xwe wan hêzan bibinin, ên, wan şiyarbikin û ji bona xebatê bi rêk û pêkxinin, ên dikarin- li ser encamê rewşa wanî civakî -hêzê pêktinin, ên dikarin kevnaryê bimalin û nuhbûnê biafirinin. Bes bitenha metiryalistiya felsefa Marx dergêh ji Pirolitarya re nîsankir, ê ji derketina kolitiya remanê, a tanî wê çaxê tevaya çîniyên sitemkêş têde dijyan. Bes bi tenê tiyoriya Marxî aburî rastiya cihê Pirolitarya di tevaya sustêma sermiyandaryê de daxuyanikirin.

Der seranserya cihanê, ji Emerika ta bi Japan û ji Siwêd ta bi Afrika jêrin saz-
mendiyên bi serên xwe ên Firolitarya xwe pirdikin. Pirolitarya der çûna xebata
xweyf çniti hîn û perwerde dibe, azad dibe ji evsanên civaka Borcuwazî, xwe her
û her didin serhev û fêr dibe, ji bona bi serketinên xwe pivanên rast û durust
deyne, hêzên xwe pola dike, û ew bêbergirtin gewre dibe.

Di adara sala 1913 de di kovara" Piroswatsenîji" J.3

libirnavnivisandin: W.I.

Danin, cildê 19.R.3-9

K A R L M A R X¹

(Bi kurtî li ser mêjuwa Marx li gel daxuyanikirinêkê li ser Marxistyê)

P Ê Ş G O T I N

Ev gotara han a li vir ku li ser Marx nala namilkakê hatiye nivîsandin, min ew nivîsandibû (weke ku tê bîra min) di sala 1913 de ji bona ferhanga Granat. Di dawîya gotarê de listake dûr û dirêj ji nivîstokên bi pîrbûn beyanî li ser Marx pê hate vekirin. Ev lîsta han di vê çapa han de nehatiye. Herwehaji Sercivata ku serpereştiya ferhengê dikir ji aliyê xwe dawîya gotarê, a ku li ser taktîka Marxîstî şûresvanî hatibû nivîsandin, ew jêderxistin jiber Çavdêryê. Mexabin, ez nikarin wê dawîyê li vir binim, ji ber nivîsandina min a pêşî li cihekî di nava nivîsandinên min de li Krakau yanji li Siwêsraya maye. Ez tînim bîra xwe, ku min di dawîya gotarê de pêre anîbû ew cihê ji nameya Marx ji bona Engels a di 16.IV.1856 de sandibû, li wî cihê ku Marx dinivîse: "The whole thing in Germany (hertîst li Elemanya) dê bête rawestandî li ser karîna piştgirtina şûresa Pîrolîtaryaya bi şêweyekî çapa dudwa a Cenga Cotkaran. Wêçaxê dê hertîst bi rêk û pêk be". Ev bi xwe Menşevîkên me ji sala 1905 de li berneketin, ew Menşevîkên me bi xwe, ên ku neha bi carekê gihane xiyaneta sosyalîstyê û xwe guheztine ser benda Borcuwazyê.

N. Lênin

Mosko, 14. gulanê 1918 de

Di sala 1918 de di pirtukekê de hate belavkirin:

N. Lenin, "Karl Marx", Çapxana "Priboi" Mosko.

K A R L M A R X di 5.gulanê de sala 1818 de li Trier(Rheinpreußen) ji Diya xwe bû. Bavê wî Advokatbû, Cihûbû, di sala 1824 çû bû Pirotistantî. Malbata Marx dewlemendbûn, Zanevanbûn lê neşûresvanbûn. Piştî bidawîkirina xwendina xwe di bustana bilind de li Trier, Marx çû ket Zanîgehê pêşî li Bonn, pişt re li Berlin, wî advokatî xwend, nemaze lêbelê Mêjû û felsefe. Wî di sala 1841 de zanîgeh anî dawîkirin dîktora xwe li ser felsefa Epîkur nivîsand. Li gora têgihîştina Marx tanî wê pêlê ew hêjî Hevalbendê Hegel bû û Nimûnevanbû. Li Berlin ew kete nava xeletî "Hevalbendên Hegelî Çep" (Bruno Bauer û ên din), ên pêradibûn ku ji felsefa Hegel havilên Bêxwedanyê û sûresvanîyê jê wergirin.

Piştî dawîkirin xwendina xweyî zanîgehê, Marx barkir çû Bonn bi hêviya wergirtina Pirofîsoryê. Lêbelê siyaseta kevneperestîya dewletê, a ku di sala 1832 de Ludwig Feuerbach ji cihê wîyî Pirofîsoryê derxist û di sala 1836 de, careke din ji nuhve nehist vegere zanîgehê û di sala 1841 de Pirofîsorê xort Bruno Bauer li Bonn nehist ew dersên xwe bêje, ev siyaseta kevneperest hişt ku Marx devji jîna zanîgehê berde. Bîr û baweriyên Hegelîyî çep di wê demê de bi pêşketîneke pir bi lez li Elemanya bi pêşvediketî. Ludwig Feuerbach destpêkir nemaze ji sala 1836 de rexne li Oldaryê bigre û berê xwe bide metiryalîstîyê, a ku di dawîya dawî de tevaya remana wî bi carekê xistê destên xwe, di sala 1841 de ("cew-hera Fîletîyê"); di sala 1843 de nivîstoka wî a "Bîngehê felsefa ayîn de" derket. Di pişt re Engels li ser van herdû danînan Feuerbach got: "Mero divabû kêra azadiya" van nivîstokan "bi xwe bidîta". " Em" (yanî Çepên Hegelî di nava wan de jî Marx) "tevde bi carekê di wê demê de bibûn Feuerbachî"⁴. Di vê demê de li Köln li bal Rûnişvanên Radikalên Rheinland, ên dîghan Çepên Hegelî, rojnameke Opozîsyon danî, bi navê "Rheinische Zeitung"⁵ (rojname Rayîn) (Wê di yekê yenayer sala 1842 de dest bi derketina xwe kir). Marx û Bruno Bauer mîna du Nivîserên bîngeh ên tê de kardîkirin. Di Oktobera sala 1842 de Marx bû Sereknivîsarê wê û ji Bonn barkir çû Köln. Di bin Serdariya Marx de rojnamê berekî demokrasîyî sûresî wergirt ku her û her bêtir dihate diyarkirin; dewletê di pêşî de ew xiste bin çavdêriya dudwayî, a sîsyayî û dawîya dawî biryarda bi fermankirina rawestandina rojnamê bi carekê ji yenayera sala 1843 de. Ji ber vê yekê Marx xwe neçar dît devjîkarê xweyî Sernivîsaryê berde, lêbelê çûna wî hêjî Rojname rizgar-nekir û ew divabû di adara sala 1843 de nema bête derketin. Di nava gotarên pir ên ku Marx di "Rheinische Zeitung" de belavkirin, ji xeynî ên hatine nîşankirin di pişt re (biner "lîfehresta kaniyan")⁶, Engels nîsandîke gotarekê li ser rewşa Rezvanan li newala Mosel⁷, karê rojnametyê ji Marx re da xuyanîkirin, ku ew di warê aburya sîyasî de hêjî pir kêr ageh-dare, ji ber vê yekê wî bi jêhatbûn xwe li karxist ji bona xwendin û fêrbûna wê.

Di sal 1843 de li Kreuznach Jenny Von Westphalen Marx mehrkir, yara xortaniya wî, a pêre hêjî di dema xwendina zanîgehê de bi dergîsbû. Pîreka wî ji Malbateke Amîrên Pîrosîyî Kevneperestbû. Bîrê wê ê mezin Wezîrê Navxweyî Pîrosîbû di pêlek

ji kevneperest tirin pêlê de, di navbera 1850-1858 de. Di payiza sala 1843 de Marx mala xwe guhezt Paris, ji bona li derve li gel Arnold Ruge (1802-1880; Çepekî Hegelî, 1825-1830 di zindanê de, piştî 1848 de Derketî; piştî 1866-1870 Bismarckî) kovareke radikalî derxine. Bes bitenê jimara pêşî ji vê kovarê hate derketin, a di bin navê "Nivîstokên Elemanî-Firensî"⁸ de ên sala ne. Di jarî li cem belavkirina bi dizî li Elemanya û cudabûna bîr û bawerî di navbera Marx û Ruge de bûn hoyê rawestandina wê. Di gotarên wî de ên di vê kovarê de hatin belavkirin, Marx mîna şûreşvanekî derdiket û bangdikir bi "rexne girtinê bîdilo- vanî li ser her tiştê heye", her wehaji "rexnegirtina liser çekan"⁹ û berê xwe komên Xelkê û Pirolitarya.

Di septembara sala 1844 de Friedrich Engels ji bona çend rojan hate Paris û ew çaxê de bû Heval û Hogirê Marx. Herdû bi hev re bi xwîngembûn xwe avêtin nava jîna gûr a komên Şûreşvanên di wê pêlê de li Paris bûn, (bi giringbûneke tay- betî bi rêya Proudhon guh dihat pêdan, a pêre Marx di sala 1847 de bi xurtî di "Perîşanya felsefê" de dawî pêanî). Wana bi xebateke germ di jî rêyên cuda ên Borcuwaziyên sosyalistiyên biçûk kardikirin û tiyori û taktika SOSYALISTIYÎ PIROLITARI a şûreşî, yaxud komonistî (Marxistî) amade dikirin. Biner li nivîstokên Marx di vê pêlê de, ji sala 1844-1848 de, di xwar de di feherista wêjeyan de. Di sala 1845 de li ser daxwaza dewleta Pîrosî ku ew Şûreşvanekî bi tirse, ji Paris berdanê. Wî mala xwe guhezt Brüksel. Di buhara sala 1847 de Marx û Engels ketin civateke pîropegendayî dizî, "koma komonistan"¹⁰ û bi karê pir hêja di kongirê vê komê de rabûn (novembara sala 1847 de li London) û li ser daxwaza wî kongirî Marx û Engels "Manîfêsta partiya komonist" a bi nav û deng danin û ew di febrayera sala 1848 de belavbû. Bi hozanbûneke zelal û bi têgihîst- bûneke bi hêz di vê nivîstoka han de tê-gihîstina nuhî cihanê dide xuyanki- rin: dide xuyanikirin metiryalistiya bihevî a meydana jîna civakî jî digre û diyalîktîk, nala zanistiya fireh û kur ji bona pêşveçûnê, û tiyoriya xebata çînî û rola şûreşî a pê Pirolitarya di mêjuwa cihanî radibe, Xwedanê civaka nuh, civaka komonistiyê.

Gava şûreşa febrayer di sala 1848 de vêket, Marx ji Belçîka hate derkirin. Ew careke din vegerya Paris, lêbelê ji wir piştî şûreşa adarê çû Elemanya, nemaze çû Köln. Li wir ji yekê tebaxê sala 1848 de tanî 19. gulana 1849 de "Neue Rhei- nische Zeitung"¹¹ (rojname raynî nuh), a ku şerekê wê Marx bû, derket. Tiyoriya nuh di rêya çûyîn bûyînê şûreşî de ên 1848/1849 de bi eşkerebûn rastiya wan bi cih dihatin, her wehaji dûra di rêya hemû tevgerên demokrasî û Pirolitari de li tevaya welatên dunê rastiya wê bi cih hate kirin. Ji nik Berberên şûreşê ên biserketî pêşî wan Marx dan ber Dadiyê (d 9. febrayer de sala 1849 de bê- gunehderket) û di piştî re ew ji Elemanya derkirin (16. gulana 1849 de). Marx di pêşî de berê xwe da Paris, piştî xwepêşdana (demostratisyon) 13 hêzêrana 1849 de ji wir ew hate derkirin û wî barkir çû London, ew li wir ma tanî mirina xwe.

Mercên jîna Derketiyan zor di jwarbûn weke ku bi eskerebûn ji namyên di navbera Marx û Engels de,ê(di sala 1913 de hatine belavkirin) tîn xuyanikirin. Pêrfîsaniya pir giran ku bi serê Marx û Mala wî de hatibû; bîyî alîkariya diravîyî gorf, a her û her ji nik Engels dihate kirin, dê Marx nebes bi tenê nikaîba "Sermiyan" banya dawîkirin, lêbelê ji bêgûman dê ew di nava rebenyê û hejartyê de bi hata fetisandin. Ji aliyê din de Rê û Berên serdar di sosyalistiya Borcuwaziya biçûk de û di sosyalistiya ne Pirolitarya de bi tevayî li ser Marx zor dikir her û her xebateke bêveger, her û her ji ew car caran naçardibû li ser Devavêtinên û Navbidûxistinên derew li ser Wî, li wan Kesan vegerîne "Her Vogt"¹² Marx xwe vedigirt, jixelekên Derketiyan û kardikir di jimarekê ji Danfînên mêjûyî, (biner li fehresta Kaniyan) dîtina xweyî metiryalistî; bi jêhatbûneke xurt berê xwe da xwendina aburiya siyasî. Marx ev zanistiya han şûreşkir (biner pişt re li Rêya Marx) di Danfînên xwe de "Rexne li ser aburiya siyasî" (1859) û "Sermiyan" (Danfina I, 1867). Pêla nuhvejandina tevgera demokrasi di Pênçî û şêst salan de careke din ji nuh ve Marx kişand jêhatbûna kar. Di sala 1864 de (september) li London Cîhana bi nav û deng hate pêkanîn "Civata Karkerên Cîhanî". Marx canê vê sazmandiyê bû û herwehaji Nivîsevanê "nameya" wêyî pêşî bû û ê jimareke dinî pir ji biryar, bozanin û daxuyaniyan. Di yeketî kirina xebata tevgerên Karkerên welatên cuda de û şeweyên sosyalistiya cudayî ne Pirolitarya, a berî Marx (Mazzini, Proudhon, Bakunin, civata Karkerên Ingilizî ên Liberal, Rastên Lassalf li Elemanya hd.) Marx hawil dida jêhatbûnên wan tevan têxe ser yek rê, pêrejî wî bi Dîtinên van hemû rêçik û dibustanan re şerdikir, wî taktîkekî yekane ê xebata Pirolitarya, ê Cîniya Karker di welatên cuda de vejand. Piştî ketina Komunaya Paris (1871), a ku Marx (di "Cenga Xwebixwe li Firensa" 1871 de) weha bi kurî, di cihê wê de, pir bi eskerebûn, bi KÊRBÛN û bi canekî şûreşî giran hêjakir, û piştî jihev perçekirina Cîhanê li nik Bakunin, ev Cîhana han nema dikaribû li ewropa bijya. Piştî kongirê Cîhanê li Hag (1872) Civata tevayî a Cîhanyê xwe guhezt New York li ser daxwaza Marx. Cîhaniya yekem bi rola xweyî mêjûyî rabû; wê rê ji bona pêlekê textî û rîstkir ji bona gewrebûneke bê şnor ji bona tevgera Karkerên hemû welatên dunê: Pêla pêşvexistina wê di firehbûna xwe de, di peydakirina Partiyên Sosyalistiyî Cemaweran de ên Karkeran de li ser zemîna dewletên milî ên yeka yeka.

Jêhatbûnên Marxî pir di Cîhanê de û ên hêjî bêtir gewre di di Xwendinê de bi carekê tendurustiya wî bi xurtî ber bi nesaxiyê û nexweşiyê de ji bîni de hejand. Wî da dû karê xwe bi danfina aburiya siyasî li ser bingehên nuh û ji bona bi dawîanfina Nivîstoka xwe "Sermiyan", ji bona vê ermancê pir metiryal civand û dest bi xwendina gelek zimana kir (ji bona nimûne, zimane rûsî); belê nexweşiya wî kelem dixistin ber wî, ku ew "Sermiyan" bîne dawî.

Di 2. dîsembera sala 1881 de Pîreka wî mir. Di 14. adara sala 1883 de, bê deng di keneba xwe de, tamara xewa mirinê da ser çavên wî. Ew li tenîsta Pîreka, li goristana Highgate li London hate veşartin. Ji Zarokên Marx hinek ji wan di menalya

xwe de li London mirin, gava ku Mala wî di bin perîşanyeke gewre û mezin de di jya Hersê Kecên wî bi Sosyalistiyên Ingilîzî û Firensî re mêrkirin: Eleanor Aveling, Laura Lafargue û Jenny Longuet. Lawê Kecawîyî dawî Endame di patiya sosyalistiyî firensî de.

R Ê Y A M A R X

MARXISTÎ sustêma bîr û bawerî û rêya Marx bi xwe ye. Marx Rêberê bi pêşvexistinê bû û Hozanê mezin bû ê hersê şapên remanên bingehî ên sedsalên nozdehan li hersê welatên pêşvexistirîn di mêjuwa Mirovanyê de: Felsefa Kilasikiyî Elemanî, aburiya siyasiyî kilasikiyî Ingilîzî û Sosyalistiya Firensî bi girêdana serpeştîyên gûresîyî Firensîyî bi carekê. Ji Berberên Marx bi xwe pê tê rûniştin, bi girêdana remana wî li dû hev û yekitiya wê bi hev re. Bîr û baweriya Marx pêktinî di tevaya xwe de metiryalistiya nuh û sosyalistiya zanistiyî nuh mîna tiyorî û pirogramaya tevgera Karkeran di hemû welatên pêşvexistî de li dunê; ev tev dihêlin em nafka bingehî a Marxîsyê, rêça aburiyî Marx, kurtbûneke bîr û baweriya wî bi carekê bi din pêşkeşkirin.

M E T I R Y A L I S T I Y A F E L S E F Î

Bi destpêkirina salên 1844-1845 de, gava ku remanên wî rengê xwe werdigirtin, Marx metiryalistibû û nemaza ji Hevalbendên Feuerbach bû, ê deqa wîyî qels ku Marx di pişt re jî bes bi tenha di wirde didît, ku metiryalistiya wî têrnedikir bi lihevhatina li dûhev û tevayîkirina wêna. Marx giringbûna mêjuyî yî cîhani a Feuerbach a "pêl pêktanî" didît bi xwe di xwe jêbirîna bi carekê ji îdialistiya Hegel û dazanfina metiryalistiyê, ev metiryalistiya ku di sedsalên hîjdehan de, nema ze li Firensa" ne bes xebatekbû di jî dezgehên siyasî ên hebûn, her weh jî di jî oldaryê û tiyoloji ên hebûn, lebelê jî... di jî hemû mitafîzîk bi xwe bû" (bi têgihîştina "Lenerînên serxweşyê" bi cudabûna ji "felsefa li ser hiş û mejî") (nivîstoka "Malbatîya perest" di "li dîhîştina wêjeyî".¹³ "Ji bona Hegel", Marx nivîsand, "tevgera bîrkinê, ev tevgera ku ew di bin navê remanê de wê dugheze dike xweyîbûneke bi serê xwe, ew yazdane (Xwedan, Durustker" ê cîhane heye... li cem min bermeqlûbê wê ye, reman nekêm û ne jî bêtir ji xeynî ku ew mirêka tevgera metiryalistiya ku hatiye guheztin ji bona mejîyê Mirov û tê de hatiye guhertin pêve niye." ("Sermîyan", I, pêşgotina li ser çapa duwem).¹⁴ Bi carekê wek vê lihevderketina felsefa metiryalistiyî Marx - Friedrich Engels nivîsand, gava wî ew reman di nivîstoka xwe "Dijî-Dühring" de daxuyanî kirin (bi xwe li wêde biner) - Marx bi xwe ev nivîstoka han xwend, berî ew bête çapkirin, di dema hêjî ew bi destan hatibû nivîsandin - "Yekitiya dunyayê pêktê ne di hebûna wê de... Rastiya yekitiya dunyayê pêktê di metiryalistiya wê bi xwe de û ev yeka han hate bicihkirin... di rêya pêşveçûneke dirêj û dijwar a felsefê û zanistiya seruştî de... Tevger

sêweyê hebûna metiryê ye. Tucarf û ne li tucihî metiryê bê tevger nehatiya dan, yanjî hîç tucarf ew nikare bête dan.... Metiryê bê tevger her wehaji tevger bê metiryê nayête kirin.... Mero ji xwe dipirse.... Çi/yêman û giyarbûn û ji kuye kaniya wan, weha mero dibîne, ku ew durustkirina mejiyê mirove, ku Mirov bi xwe ew durustkirina serustiyê ye, ê ku di û bi dorhêla xwe ve tê bi pêgvevexistin; evaya xwe bi xwe dide li berxistin, ku durustkirinên mejiyên Mirov, ên ku di dawiya dawî de, belê ew jî durustkirinên serustiyê ne, ew dijî tevaya serustiyê nînin, belê ew bicarekê li gora wê bi xwe ne". "Hegel Nimûnevan bû, yanî di dîtina wî de, reman di serê wî de bes bi tenha xwe ne kêr ne bêtir ew nala mirêk kirina wêneyê rûti biserexwe ne" (car caran Engels gotina "jêbixwe" bi kartine) "Tişt û bûyinên rast, lêbelê li nik wî bermeqlûbî bû, li gora dîtina wî tişt û pêsketina wan bes bi tenha xwe mîna wêneya remaneke mirêk kir ku ew carekê li cihekî berî hebûna dunyê ew hebû".¹⁵ Di nivîstoka xwe de "Ludwig Feuerbach", a tê de Engels bîr û baweriyên xwe û ên Marx li ser felsefa Feuerbach derdixine, wî ew neda çapkirinê tanî wî careke din li xwendina destnivîsandina Kevin Venegerya a li ser Hegel û Feuerbach û têgihîştina metiryalistiya Mêjuyî, a wî û Marx bi hev re di 1844-45 de danfûn, Engels dinivîse: "Pirsiyariya gewreyî giring di her felsefakê de, ne-maze di felsefa nuh de, ew pirsiyariya pêwendîya di navbera reman û hebûnê de ye... Yanjî pêwendîya hiş li gel serustiyê... Kijan ji van berî a dine, gelo hiş yanjî serustî?... Li gora bersevkirina vê pirsê, Feylesuf xwe perçeyî du bendên mezîn dîkin. Ên ku berfûna hiş beramberî serustiyê pê rûdinin, weha ew di dawiya dawî de peydakirina dunyayê bi regekî dibînin, çibe celebê vê Peydabûnê.. Ew benda Idialistiyê pêktînin. Ên din, ên ku serustiyê mîna kokê dibînin, ew digên dibustanên metiryalistiyî cuda!"¹⁶ Her bikaranîneke din ji bona têgihîştina idialistiyê yaxud metiryalistiyê (di bin têgihîştina felsefê de) ew bes bi tenha tevlihevbûnê peyda dike. Marx bi carekê ne bes tenê idialistiya bi vî tonî yaxud ên din, ku her û her bi olve girêdayîbûn, davêtin, lêbelê jî dîtînin Hume û Kant, ku di van rojên me de bi taybetî pir belavkirine û herweha jî Jênehatî (Agnostizmus) Rexnegirtî (Kritizmus), her weha jî Pozitivist bi hemû rengên xwe vê, felsefaka weha li cem Marx her û her mîna daketineke "kevneperestî bû" ji bona idialistiyê û di başbûna xwe de bi her awayekî mîna "regekî bêsermbûn bû ku bi dizî bi metiryalistiyê rûdiniştin û beramberî Xelkê xwe jê dîrdikirin". Li ser vê pirsê ji xeynî wan nivîstokên hatine dan ji ên Engels û Marx temasebikin li nameya Marx ji bona Engels di 12. desembera sala 1868 de, a tê de Marx di peyve li ser peyva Lêgerê serustiyî bi nav û deng Th. Huxley, ku ew têde derdixine, ev Zanistvan "metiryalist" derdikeve bêtir ji ku wî xwe derdixist û ew mukurhat "Weha bi dirêjbûna ku em bi rastî çavlêbûnê û remanê dîkin, em nikarin bi awayekî ji metiryalsitiyê derkevin". Pêrejî Marx navbidûdixine ku wî "deryekî veşartî vekir" ji bona Ne-karîbûnê (Agnostizmus) û ji bona dîtina Hume.¹⁷ Bi taybetî bêtir divê bête diyar û eskere kirin bîr û bawerîya Marx li ser pêwendîya di navbera azadyê û pêwist-

yê de: "Pêwistbûn bes kore, tanî ku ew neyête liberketin....Azadî tégihistina pêwistbûnê bi xwe ye". (Engels" Dijî Dühring")¹⁸ Evaya dide xuyanikirin pêrûnistina qanûnmendiyên bi serê xwe ên seruştiyê û guhertina pêwistiya diyaliktikî ji bona azadiyê (Pêrejî bi guhertina" tistê bi xwe" ê nenas, lêbelê ê dikare bête naskirin, ji bona "tistekî ji bona me", ê "cewhera tistî" dughere di "xuyaniyan" de).

Kêmaniya bingehî di metiryalistiya "Kevin" de pêrejî metiryalistiya Feuerbach (belê jî metiryalistiya "arzan" a Büchner, Vogt û Moleschott), di dîtina Marx û Engels de dihatin dîtî di: 1. ku ev metiryalistiya han bi "pirbûn mēkanîkî-bû" a ku nuhtirîn pêsketinên Kîmya û Biyolojî (di van rōjên me de tēte pêvekirin: tiyoriya elektrîkê a metêr yê) guhpênedidanê; 2. ku metêryalistiya Kevin ne mējuyî bû û ne jî diyaliktikî bû (Mētafizîkî bû bi liberketina dijî diyaliktik) û ne jî dîtina pêsketina tanî dawî û ji hemû alî de tanî derxistin. 3. wēna "Cewhera Mirov" nala rûbûnekê bi serê xwe û mîna "komek ji pêwendiyên civakîyî tevayî" (ên mējû bi gēweyekî rast û durust pêkatanî) li berdiket, û ji ber veyekê dunya bes tenê "lêvedgerand", di dema ku nêtbû, wê "bidin guhertin", yanî metêryalistiya Kevin giringbûna "jêhatbûna kariyî gûresî" nikarî bû li berketa.

D I Y A L I K T I K

Di diyaliktika Hegel de Marx û Engels firehtirîn, di navxwe de dewlemendtirîn û kurtirîn pêsketina rêya qeçî bidestkeina ku felsefa Elmaniyî Kilasîkî bi ciani ye. Her gēweyekî daxuyanikirinê li ser bingehê pêsketinê, xwe guhertinê ji wan re yekalî dihate xuyani kirin, di navaxwe de perîşan, çûna rastiya pêsketinê bixerabûn û jiqalikê xwe derketî derdixist (a xwe pir caran di çengbûnan de, di wêranyê de û di gûresan de) di seruştiyê û civakê de xwe pêkatanî. "Ez û Marx bigir bi tenha xwe bûn, ên karkirin ji bona rizgarkirina diyaliktika giyî" (herweha jî ji idialistiya Hegel bi xwe jî) "ev jî bi xistina wî di tégihistina metêryalistiyê yî seruştiyê de". "Seruştî cihê ceribandîne ye li ser diyaliktik û divê bête gotin ku zanistiya seruştiya nuh bi xwe ji bona vê ceribandîne pir tistên zor bi nerx û buha pêşkeş kirin". (evaya hatiye nivîsandin berî dîtina Radium, Elektronan û guhertinên perçan hê...!), "ev tistên han roj bi roj bêtir dibûn. weha van zanistiyên han biçihanî ku di seruştiyê de di dawîya dawî bi diyaliktikî tê karkirin û ne bi Mîtafizîkî".

Sitendina Xwedîbûnê û derkirina bireke mezin ji Xelkên gundan li gel Karkeran ne bes tenê çarên jî nê û karkirinê ên wan ji bona sermiyanê çêkirinê azad dikin, lêbelê ew bazara hundurû peyda dikin. ("Sermiyan", R. 778)³². Perîsankirin û wêrankirina Xelkên Gundan ew ji aliyê xwe ve yarmetiyê dide, ku Laşkerekî hilanînê ji Karkeran ji bona sermiyan bête peyda dikin. Di her welatekî de ji welatên sermiyandarî "her û her perçayekî ji Xelkên Gundan li serkenarê li dûhev ku ew bibin Xelkên bajaran, yanjî Xelkên di (çêkirinê de kardikin...., yanî ne di çandinyê de). Ev kaniya bêtirbûna Xelkêyî ligorê weha li dûhev ew tê herikandin... Karkerê çandinyê neçar dibe bi wergirtina sînorê kêmbûnê ji kirê; û ew bi piyekî xwe her û her di avgireke geniyî perîşanyê de radiweste". ("Sermiyan", I², R. 668.). Xwedîbûna Cotkarî taybetiyî li ser erd, ê ew hiltine û datîne, bingehê berkirina biçûk û mercê gesbûna wî pêktine, merc pêktine ê dihêle ku bighê rengê xweyî kilasîkî. Lêbelê ev berkirina biçûk bes bi tenê bi bergirtinên berkirinê û civakê ên teng û hovber ve lihev dikin. Di sermiyandaryê de "çewisandina Cotkaran li gel çewisandina Pirolitariyên çêkirinê têne cudakirin ne bes di rengê xwe de. Xebatxwer her wek xwe ye: sermiyan. Sermiyanên yeka yekan Cotkarên yeka yekan di rêya giraw û selefê de diçewisînin, Çîniya Sermiyandar çîniya Cotkaran di rêya bêşên dewletê de diçewisînin." ("Xebata çînî li Firensa"³⁵) "Perçeyê biçûkî erdê Cotkar hêjî ew bes perdeye, ê rê dide Sermiyandar qazancê, karê û kirê ji erd bigîsîne û ew Xwediyê erd bi xwe dihêle ji xwe bibîne, bê çawa kirya karê xwe ji xwe re derxîne." ("Brumair hijdehan").³⁴ Di rêzanê de Cotkar, belê ji bona civaka sermiyandarî, yanjî ji bona Çîniya Sermiyandar perçakî ji kirya xwe pêşkes dike fî jê dadikeve "li ser rewşa erdgirtvanên Erlendî" - "û bi carekê di bin perda ku ew bibe Xwediyê erd", ("Xebata Çînî li Firensa"³⁵). Ma gelo çiyê" sebeba bê çima buhayê genim û ceh li welatên bi pirbûn xwedîbû-erdên biçûk tê de heye kêmtire ji welatên ji welatên tê de şeweyê berkirina sermiyandarî heye"? ("Sermiyan", III², R. 340). Ji ber ku Cotkar ji bona Civakê (yanî Çîniya Sermiyandar) perçayekî ji bêtirbûna durustkirinê belaş dide. "Ev buhabûna nîzim" (a genim û ceh û durustkirinên çandiniyê ên din) "ew bi xwe havi- vilê perîşanya Berkirvane û hîç bi corekî ew ne berkirina karê wane". ("Sermiyan" III², R. 340)³⁶. Xwedîbûna perçên erdên biçûk, a rengê serûstiyî berkirina biçûke, ku di bin sustêma sermiyandaryê de tê jihev xistin, wêrankirin û windakirin. "Xwedîbûna perçeyên erdên biçûk li gora serûstiya xwe nahêlin: bi pêşvexistina hêzên berkirina civakî ên kar, şeweyên civakî ên kar, komkirina civakiyî sermiyan,

xwedikirina ters bi regekî pir mezin û bi pîrbûn bi karanîna zanistiyê. Se-
lef û sustêma bêsan li her der û cih xwedibûna erdên perçeyên biçûk wêrandikin.
Sermiyane tê bikaranîn ji bona kirîna erd ew tê kîşandin ji çandinyê. Bê dawf-
kirina perçerkirina çarên berkîrinê û Berkîrvan tîn jihev belâ kirin bi xwe."
(Li gel hev, yanî Civatên Cotkarên biçûk, ên bi mezintirîn roleke Borcuwaziyî
pêşverû radibin, ew bes dikarin wî berî qelsbikin, bêyî wî hilînin; Mero divê jî
ji bîra neke, ku ev legêvbûn pir didin Cotkarên dewlemend, lêbelê piranya
Cotkarên perîsan pir hindik didin wan, yanî bigir tîstek bi dest wan nakeve,
û ev Ligelhevbûn bi xwe tîn dibin Xebatxwerên karê bikirê). "Windabûneke pir
mezin ji hêza Mirovan. Her û her bi gewrebûn mercên berkîrinê xerabtir dibin
û buhakirina çarên berkîrinê, herdû qanûnek pêwestî ye a xwedibûna perçeyên
erdên biçûkin." Di çandinyê de her wehajî di çêkirinê de sermiyandari pêktîne
bi pêkêrkirina berkîrinê bes bi tenê ji bona lista "Goriyên berkîrinê". Ji hev
bela welabûna Karkerên çandinyê li ser toprêxên mezin liberxwedana wan tê gîke-
nandin, di çaxa komkirina Karkerên bajaran libexwedana wan bi hiner tir dikin.
Di çandinya nuhî sermiyandari de û her wehajî di çêkirina kar di rêya berzki-
kirina hêza berkîrinê de û gewrekirina bêtkirina kar di rêya wêrankirina
hêza kar û windabûna wîna bi xwe. Û her pêşketinek di çandinya sermiyandaryê
de ne bes tenê hinereke di pêşketina talankirina Karkeran de ye, lêbelê pêrejî
hunere di talankirina erdê bi xwe de ye... Berkîrîna sermiyandaryê bi pêşve-
dixîne ji ber vê yekê bi tenê teknîk û bi yek kirina bihev kêrkirina berkîrîna
civakî, di dema ku ew tevaya kaniyên tevaya dewlemendbûnê jê tîn pişqandin ew
wana dimîçiqîne: Erd û Karker." ("Sermiyan", I, dawîya deryê 13³⁷).

S O S Y A L I S T Î

Ji ê derbasbûyî tê dîtin, ku Marx neçarbûna guhertina civaka sermiyandaryê
ji bona civaka sosyalistiyê bi tenha xwe û bes ji lêvenerandina qanûna aburiyî
civaka nuh derxistîye. Civak kirina kar, a bi hezar regekî her û her bi lez-
bûneke bêtir bi pêşve têxistin û di nîvsedsalê derbasbûyî de di ser mirina
Marx de bi taybetî bi eskere tê diyar kirin gewrebûna çêkirina mezin, di Kartel,
Sindikata û Trestên sermiyandari de, her weha jî belê di dêwbûna gewrebûn û
fireh û hinera sermiyandarê darayî de - evaya bîgehê pêşiyî ê meteryalî ji
bona neçarbûna hatina sosyalistiyê ye. Hinera gerandina vê remanê û a sincî û
bicihanîvanê meteryalî ê vê guhertinê Pirolitarya bi xwe ye a li bal sermiyan-
daryê hatiye fêrkirin. Xebata Pirolitarya dijî Borcuwazyê, a rengên cuda werdîg-
re û her û her di nava xwe de dewlemendtir dibe, dê bibe ji neçarî xebateke
siyasî, berê xwe daye ji bona wergirtina Desthilatiya siyasî di rêya Pirolitarya
de ("Diktatoriya Pirolitarya").

Civak kirina berkirinê pêwsitdikin bi guheztina çarên berkirinê ji bona kirina wan xwedîbûna civakî û ji bona "sitendina xwedîbûnê ji Talanvanên wê". Gewrebûna berzkirina berê berkirinê ê kar, kurtkirina roja kar, xistina karê bi hev re ê jîr dewsa mayînen berkirina biçûkî hovberî ê ji hevbela wela û li ser kavlên wî, evana bi xwe ne havilên xweser ên vê guheztinê ne. Sermiyandariya pêwendiyên di navbera çandinyê û çêkirinê de bi çarekê tarwar dike, lêbelê pêrejî amade dike di pêşvevexistina xwe de perçeyên nuh ji bona pêkanîna vê pêwendiyê, ji bona bi yek kirina çêkirinê bi çandinyê re li ser bingehê bikaranîna şiyarbûn a zanistiyê û li ser bingehê bihevgerîdana karê bihev re, ji bona belavkirineke nuh a wargehan ji bona Xelkê (bi dawî anîna bi tenabûna gundan û hovberiya wan, her wehaji bi dawî anîna liser hev siwarbûna jimara Xelkên bajaran di bajarên gewre de bi regekî nesorûstî). Rengekî nuhî malê, mercên nuh ji bona Pirekê û perwerdekirina Nifsên nuh tên amade kirin di rêya rengên bilind ên sermiyandaryê de: Karên Pirek û Zarokan, jihevketina malbatîya batriyarkî di rêya sermiyandaryê de di civata nuh de bi neçarbûn nebaştirin, pistirin û dilxelandtirin formê wêrankirinê werdigirin. Pêrejî "çêkirina gewre, bi dana wê ji bona Pirekan, ji bona Kec û Xortan, ji bona Menalan ji Nêr û Mê roleke giring di bihevkerkirina berkirina bi rêxistiyî civakîyî derveyî karê malê, ku bingehêkî aburiyî nû ji formekî bilind ji formên malbatîyê û pêwendiyê di navbera Nêr û Mê de peyda dike. Bi xwe jî serûstiyê bi bêvacî tê danîn, ku formê filetiyê ê Cermenî, ê malbatîyê nala bi serê xwe deynin weke formêk Romanîyî kevin, yaxud ê Yunaniyî kevin, yaxud ê Rojhilatî, ên bi xwe di navbera xwe derêzekê ji pêşveketinêke difrokiyî lidûhev pêktinin. Weha tê derxistin, ku siwarkirina tevlihevî Kesên Karker, ji Kesên Nêr û Mê û ji temenên cuda, pêrejî dizikmakîyî dirindaneyî rengê sermiyandaryê de, ku Karker ji bona bikêrkirina berkirinê ne û ne berkirin ji bona Karkeran heye, ew kaniyekê pêktine dagirtiyê bi xerabûnê û koletiyê, ev siwarkirina han divê bête guhertin bi bermeqlûbê xwe, di bin mercên çak de bibe kanî ji bona pêşketina Mirovanyê ("Sermiyan", I, dawîya deryê sêzda). Sustêma fabrikê ji me re dide xuyanîkirin "nafka perwerdekirina dema tê, a ji bona tevaya Zarokan di ser temenekî nîşankirî re ku karê biber bi hînkirin û şîport re tête girêdan, ne bes tenê nala rêyekê ji bona bilindkirina berkirina civakî, lêbelê rêya bi tenha ye ji bona berkirina Merevên ji hemû aliyî de bi pêşveketine" (kaniya berê). Li ser bingehê mêjuyê bi xwe sosyalistîya Marx pirsîyariya Milî û Dewletê datîne, ne ji bona bes bi tenê buhurandinê bide xuyanîkirin, lêbelê bi mêranî dema tê bibîne û rabûn bi karekî hişmendî jibona bi cihanîna wê. Netewe berkirinên neçarin û rengên neçarin ên koca Borcuwaziyê ji pêşketina civakêne. Wehaji Çîna Karker xwe nikarîbû xurtbikra, bistewya û xwe bida hev bêyî "Xwe nala Netewakî pêkbîne" bêyî bibe "Milî" ("eger jî bi tu regekî ne bi têgihîştina Borcuwazî be"). Lêbelê pêşketina sermiyandaryê her û her berbendên Milî tarwar dike, bi tenêbûna Milî wêran dike û perçebûna Çînî li dewsa ên Milî datîne.

Ji ber vê yekê bi carekê raste ku li welatê sermiyandariyî bi pêşveketî "Karker bê welatên" û "bi yek kirina pêrabûnan" bi kêmanî a Karkerên welatên bajêrkirî ji bona Pirolitarya "Mercek ji ê pêşî ji bona riçgarkirina wane". ("Manifêsta Komonist").³⁸ Dewlet, ev zordariya bi rêxistî bû pêwisteyek li ser nêrdewaneke nîşankirî ji pêsketinâ civakê, gava civakê xwe di çiniyên lihevnekirî parvekir, gava wê nema karî bû bêtir bijya bê "Deshilatiyeke", a dihate xuyanikirin ku li ser civakê radiwestiya û tanî sînorekî xwe jê dûrdikir. Ev dewleta ku di nava pevçûnên Çîniyan de pêktê, dibe "dewleta Çîniya xurt tir û a aburî serdartir, a bi rêya dewletê dibe ji Çîniya siyasiyî serdar û weha çarên nuh bi destdikevin ji bona tewandin û çewisandina Çîniyên bindest. Weha bû dewleta kevnan, berî hertistî, dewleta Xwedîyên Kolan ji bona tewandina Kolan, weke dewleta Derebegyê organa Mîran bû ji bona tewandina Peya û Cotkarên bindest û dewleta helbijartiyî nuh destika çewisandina Karkerên bikirê di rêya sermiyan de". (Engels di "Koka Malbatyê, Xwedîbûna taybetî û dewletê",³⁹ a tê de bîr û baweriyân xwe û ên Marx dane derxistin). Bi xwe azad tirîn û pêşverût tirîn rengê dewleta Borcuwazî, a komara demokratî, bi hîç corekî vê rastiya han hilnayî ne, lêbelê bes rengê wê dughere (çirêdana dewletê bi borsê re, bertîlkirina Mamûr û Rojname xweser yanjî ne xweser, hd...). Sosyalistî, a xwe dajo ji bona hilanîna Çîniyan, pêrejî ew xwe dajo ji bona hilanîna dewletê. "Karê pêşî ê dewlet tê de bi rastî nala Nêwerê tevaya civakê derdikeve- sitendina Xwedîbûna çarên berkirinê ye bi navê civakê -, evaya bi xwe jî karê wê yî dawî ye ku bi serê xwe nala dewletê ew pêradibe. Destdirêjkirina desthilatiya dewletê di pêwendiyên civakê de di berekî de piştî ê din dibe zêde û di pişt re ew ji ber xwe radizê. Li dewsa serdariya li ser Kesan derdikeve sermiyandariya tîstan û bi rêbirina bihevkerkirinên berkirinê. Dewlet nayête "hilanîn", ew tête "mirandin" (Engels, "Dijî Dühring").⁴⁰ Civaka ku berkirinê li ser bingeşê bihevrebûna azad û wekhev a Berkirvanan ji nuh ve bi rêk û pêk dixînin, tevaya mîsanizma dewletê dughezîna wêderê, ew cihê ku ew dê tê de pişt re bimîne: ji bona Xanîyê (museyum) kevnanan, li tenîştî çerxa rêstinê û tivrê bironzî". (Engels "Koka Malbatyê, Xwedîbûna taybetî û dewletê").

Û dawî li ser rawestandina sosyalistîya Marx ji Cotkarê biçûk, ê dê bimîne hêjî piştî koca sitendina xwedîbûnê ji Talankeran, weha divê li ser daxuyan yeke Engels bête agehdarkirin a ku bîr û baweriyên Marx derxînin: "...Gava em bibin Xwedîyê deshilatiya dewletê, em nikarin carekê bînin bîra xwe, ku ji Cotkarên biçûk bi darê zorê Xwedîbûnê ji wan bistînin (ci jî bi beramber yanjî bê beramber), weke ku em vê beramberî Xwedîyên erdên mezin ji neçarî bikin. Karê me beramberî Cotkarên biçûk berî hertistî tête dîtin, berkirina wîyî taybetî û Xwedîbûna wîyî taybetî berê wê bidin hevkarîya bihevne, ne bi darê zorê, lêbelê di rêya nimûnekirinê û pêşkeşkirina yarmetiya civakî ji bona vê armancê. Û li vêderê pir çare li nik me hene ji bona pêrûnistîna Cotkaran bi hemû basiyên

ev guhertina han pê tèn rûçik kirin, ên wân Cotkaran ji neha de divên bêtin li berxistin"(Engels, " Li ser pirsyariya çandinyê li rojava", hetiyê çapkirin li nik Alexejewa, R.17, wergerandina rusî bi sasbûna re. Aslî di rojnama " Neue Zeit" de⁴¹).

T A K T Î K A X E B A T A P I R O L I T A R I Y Î Ç Î N Î

Marx, ê hêjî ji 1844/1845 de bi eşkere kêmanîyek bingehî di meteryalistiya kevin de da xuyanîkirin, ku wê mercên jêhatiyên rastyên suresê nikarîbû li-berketa û ne jî giringbûna hêjakirina wê nasbikra, wî di jîna xwe de bi carekê bi karên xweyî tiyorî re, her û her guhdida bi pirsyariyên taktîka xebata Pirolitariyî Çînî. Tevaya danînen Marx û bi taybetî ji sala 1913 de çapkirina hercar danînen ~~Marx~~ Engels re di vî babetî de lêvegerandinên pir dewlemend din. Ev lêvegerandinên han hêjî pir dûrin ku ew bi carekê hatine civandin, hêjî pir dûrin ji parvekirina xwe, ji lêvenerandin û lêgerandina xwe. Ji ber vê yekê divê li ser me li vir em li ser rûnkirinên tavayê û kurt razîbibin, tevî ku divê bidin xuyanîkirin, ku Marx meteryalistî bêtî VI alî bi rastî ne tamam, yekalî û bê can datanî. Karê pêsiyî taktîka Pirolitarya Marx sînor dîkir bi siwarbûneke pir xurt bi hemû bîr û baweriyên xweyî bingeh û têgihistina xweyî meteryalistiyî diyaliktîkî re. Bes bi tenha lênerîneke bi serê xwe a tevayî yî ligelhev bi carekê ên hemû Çîniyan ân civakeke nîşankirî û pêrejî lênerînek bi serê xwe a nêrdewaneke pêşveçûnê a vê civakê, her wehaji pêwendiyên ligelhev di navbera wê civakê û civakên din de, ev bi tenha xwe dikare nala bingehê tektîkeke rast be ji bona Çîniya pêşverû. Li ser vê yekê, tevaya Çîniyan û tevaya welatan divê li wan bête nerîn ne di rawestandina wan de, lêbelê di livandina wan de, yanî ne di xuyaniya wanî melisandî, dê-lê di tevgera wan de (tevgera ku qanûnên ji mercê aburiyî jîna her Çîniyekê tèn derketin). Tevger ji aliyê xwe de lê tete nerin ne ji aliyê dema çûyî, lêbelê jî lê tete nerin ji aliyê dema tê, bi xwe ne ligora têgihistina pûçî "Pêşveçûnvanan", ên bes bitenha guhertinên hêdî hêdî dibînin, lêbelê li gora diyaliktîkê tèn kirin. Marx ji bona Engels nivîsand: divê mero bawerîneke, " ku di pêşveçûnên gewreyî mêjuyî bi xwe de, bist sal j rojekê nebêtirin, dibejî bîstre careke din roj bikaribin bîn, ku di nava wan de bist sal xwe bighînin hev" (Nameyên ligelhev", danîna III, R.127). Di her nêrdewaneke pêsketinê de, di her bêhnekê de divê taktîka Pirolitarya vê diyaliktîka neçarî bi serê xwe a mêjûwâ Mirovanyê guhbidê ev jî ku ji alîkî de ew pêla rawestandina siyasî, yanjî bi pêsketina mesa reqê a hêdî, a jêre tê gotin pêşveçûna " asîtî" ku tê bi karanîn, ji bona şiyarbûnê, hinerê û karîna xebata Çîniyên pêşverû bi pêşvexînin û ji aliyê din ku ew tevaya vî karî girêdide li ser "armanca dawî" a tevgera vê çîniyê û bi amade-

kirina wê, ku ev Çîniya han bikaribe birast; çarekirina karên mezîni li ber xwe di rojên giran de çare bike, "ên bist salan di nava xwe de dicivînin". Di vî warî de du lêvenerandinên Marx hene, nemaze pir giringên: yek jê di nivîstoka "Perîşanya felsefê" de li ser xebata aburî û sazmandiyên aburî ên Pirolitarya, a din di "Manîfêsta Komonist" de li ser kar û barên siyasî ên Pirolitarya. A pêşî wek tê de hatiye: "Çêkirina gewre Komekê ji Xelkên hevnenas li cihekî li hev dicivîne. Berberî di kara wan de, wan jihev perçe dîkin. Lêbelê parastina kirê, ev kara bi hev re beramberî Serekên xwe, wan bi yek dîkin di remaneke bihev - ji bona liberxwedanê û hevalbendiyê..... Di pişt re "Hevalbediyên bi tenha xwe di pêş de pêktinin... dibin bir û beramberî sermiyan her û her tîni lihevkomkirin parastina yekitiyan ji bona wan pêwsitire ji parastina kirê di cavên Karkeran de... Di vê xebatê de - cengeke rastiyî Xelkêyî navxwe- hemû perçên pêwistî xwe yek dîkin û xwe bi pêşvedixinin ji bona serê tê. Û gava dîgê vê deqa han, Havlbendî rûcîkekî siyasî werdigre."⁴³ Li vir hêjî tîni ser bibîr xistinên pir, ên Marx û ên Engels li ser nimûna tevgerên Karkerên Ingilîzî didan xuyanîkirin bê çawa "Gesbûna" çêkirinê pêrabûnan derdixîne" ji bona kirîna Pirolitarya ("Nameguheztin" li gel Engels, I, R. 136)⁴⁴ û dîrkirina wan ji xebatê, û bê çawa ev gesbûna han bi tevayî Karkeran "bêsinçî dîkin" (II, R. 218); bê çawa Pirolitarya Ingilîzî "Borcuwazî dibe, weha ev Netewê Borcuwazî tîrîni di nava Netewan de" (Netewê Ingilîzî) "tê diyarkirin ku ew dixwaze dawî li tenîsta Borcuwazyê, Arostokratiya Borcuwazî û Pirolitarya Borcuwazî pêk bîne" (II, R. 290)⁴⁵; bê çawa "hinera sûresî" ji Pirolitarya tê "derxistin" (III, R. 124); bê çawa Mero divê demeke bê-tir yan kêmtir çavdêr yê bike tanî" Karkerên Ingilîzî ji xuyaniya ketina nexweşiya Borcuwaziya xwe rêzgarbikin" (III, R. 127); bê çawan tevgera Karkerên Ingilîzî ji "Mêrxasiya Chartistên kevin" ketine⁴⁶ (1866; Danîna III, R. 305)⁴⁷; bê çawan Serekên Karkerên Ingilîzî celebekî Nivî pêktinin" di navbera Borcuwaziyên Radikalî û Karkeran de" (Danîna IV, R. 433)⁴⁸. Taktika xebata aburî bi girêdanê li gel çûna tevayî (Û HAVILÊ) tevgera Karkeran li vêderê lê tê nerin bi lênerineke pir fireh, ji hemû aliyan de, bi sêweyekî pir bilind, diyalîktîkî û bi rastî sûresvanî.

"Manîfêsta Komonist" li ser taktika xebata siyasî tîza Marxîyî bîngêhî danî: "Ew (yanî Komonist) xebatê dîkin ji bona kara Çîniya Karker û armancên wêyî xweser, lêbelê ewana di dema neha de tevgerê û pêrejî dema tê a tevgerê nêwerdîkin"⁴⁹, ji ber vê yekê Marx di sala 1848 de li Polonya partiya "sûresa çandinyê" pişt digirt, "yanî partiya ku rabûna ser xwe a Krawko di sala 1846 de vexist". Li Elemanya Marx di sala 1848/1849 de Demokratiya sûresvanîyî sert pişt digirt, û wî di pişt re jî tucarî ji wî taktîkî venegerya, bê ka wî wê çaxê li ser taktîkê çî gotibû. Wî li Borcuwaziya Elmanî dinerî nala perçayekî, "ku di pêsiya pêşî de mêldariyê Xinêzyê bû dijî Gel" (bes bi tenha Hevalbendî li gel komên Çîkaran de bikariba Borcuwazyê tevaya karên li ser xwe

bihîsta bi karbînin) " û ji bona lihevhatinekê bi Nêwerên tackirî re ên mêl-dariya civaka kevin dikirin".Li vê derê em, jihev vekirina dawî a Marx li ser rewşa Borcuwaziyî Elemaniyî Çînfî di koca sûreşa Borcuwaziyî demokratî de da, dibînin. - tevî ev jihev vekirina han nimûneyekî pir pilindî Metirya - listyê ye, ê civakê di tevgera wê de lê temaşê dike û pêrejî ne bes tenê ji aliyê tevgera a berî xwe daye BER BI PASVEÇÛNÊ de: ...Bêyf bawerî bi xwe (yanî Borcuwaziya Elemanî - Wergêr), bê bawerî bi Gel, Tengijyê beramberî Jor, dilerize beramberî Jêr...ditirse ji bahozên cihanî...Li her cihêkî bê hêze... Ji her derê dizîkirye...jêhatbûn tê de nemaye...mfna Kalekî herizî nivir tîn li ser kirin, dîl û berdest xwe didît; jiber qazancên pîrbûna xwe, dibe Rêberê Palpêdanên gencî pêşî ji bona Meletekî xortî li ser xwe...." ("Neue Rheinische Zeitung", 1848; biner " Lidûxwe histina wêjeyî", Danîna III, R. 212⁵⁰). Pistî nêzîka bist salan Marx di nameyekê de ji bona Engels re daxuyamî kirin (Danîna III, R. 224⁵¹) ku biserneketina sûreşa 1848 seba wê, xwetevnedana Borcuwaziyê di wê çaxê de ew bi koletiyê rûdinistin, ji dilva li ser bi tenhabûna karîna xebatê ji bona azadiyê. Gava koca sûreşên 1848/1849 hate dawî kirin, Marx destpêkirî dijî her listikekê bi sûreşê (xebat dijî Schapper, Willich) û wî daxwaz dikir, ku di pêla nuh de Mero divê li ber kar keve, di bin perda "aşîtiya" xuyamî, sûreşên nuh amade bikin. Bi çî awayî Marx dixwest ev karaya bête kirin, dê bête dîtin ji hêjakirina wî li ser rewşa Karkeran li Elemanya di dema tarîna tirîna a Kev-neperest yê de, di sala 1856 de: " Her tişt li Elemanya dê bête rawestandîna li ser karîna pistgirtina Sûreşa Pirolitarya di rêya celebekî Çapa dudwa de ji cenga Cotkaran" ("Name guheztin" li gel Engels, Danîna II, R. 108⁵²). Bi dirêjbûna ne dawîkirina sûreşa demokratî (borcuwazî) li Elemanya, Marx guhên xwe bi carekê dabûn ser geskirina hinera demokratî a komên Cotkaran di taktîka Pirolitarya yî sosyalistî de. Ew di wê bîr û baweryê de bû, ku rawestandîna Lassall" bi serê xwe ... Xinêzbariyeke ji bona tevgera Karkeran ji bona kara Pirosoya" (Danîna III, R. 210); ji ber Lassall bi xwe jî ji bona Xwediyên erdên mezin û Milfyên Pirosoyî re yarmetî ji wan re dikir. Li nik guhertina bîr û bawerîyan bi Marx re li ser danîna xuyaniyekê bi hev re di rojnama de, Engels di sala 1865 de nivîsand, "Di welatekî çandiyê de...bi xwe bêserbûneke, bi navê Pirolitarya çêkirinê bes bi tenha xwe hêrîş li ser Borcuwaziyê bête kirin, lêbelê li tenîsta wê çewisandîna Patriyarkî a bi qamçî ji bona Karkerên çandinyê di rêya Derebegên Mîrêm mezin de hîç bi tu gotinekê nayên bi bîrxistin" (Danîna III, R. 217)⁵³ Di pêla jî 1864 tanî 1870 de, gava pêl giha dawîya xwe, ku tê de eûreşa demokratî Borcuwazî li Elmanya giha dawîya xwe, di vê pêlê de, a tê de Çîniyên Xebatxwer li Pirosoya û Nemsaya li ser ser dikirin, vê sûreşê bi vî corî yanjî yeke-kî din ji JOR wê pêkbînin, Marx ne bes Lassall gunehbar dikir ji ber "çav didan" Bismarck, her wehaji Liebnecht rastî dikir, ê ketibû "dildariya Nemsaya" û destpêkiribû li ber basbûnên cih dida; Marx taktîkekî sûreşî dixwest, ê weha bi xurtî bi wekhevî dijî Bismarck, her wehaji dijî Nemsaya bi xwe, taktîkekî ku xwe li gorê ne dikir ji bona Yunkerê Pirosoyî "biserketî", lêbelê xweser xebata sûreşî dijî wî

nuh dikir, Û BI RAST LI SER TIRADA, ku tède bi serketiya Firosofî dihate derketin. ("Name guheztin" bi Engels re, Danîna III, R. 134, 136, 147, 179, 204, 210, 215, 418, 437, 440, 441.⁵⁴) Di nameya Çihaniya bi nav û deng di 9. September 1870 de, Marx Pirolitarya Firensî agehdar kir bi ne kirina Rabûneke ser xwe berî sitewandina wê⁵⁵; lêbelê gava Rabûna ser xwe tevlivêji vêket (1871), Marx ji dil û tevaya canê xwe ve ev Rabûna sûresî a komên Kelkê bi xurtî bîrozkir, ev "hêrfîşa birina ser ezman". (Nameya Marx ji bona Kugelmann⁵⁶). Bi serneketina pêrabûna sûresî di vî nîrîr de, weka nala nîrên parî din, ji aliyê dîtina materyalistiya Marxîyî diyalîtîkî ji bona tevaya çûna xebatê Pirolitarya û ji bona hevîlê vê xebatê, xerabîyek biçûk bû, ji xerabîya daketîne ji cihê girtî û berdestkinê bê xebat: Dîlbûneke weha dê Pirolitarya ji Mêrxasî bixista û dê ew çavtirsandî bikira. Marx, ê bi çavekî pir baş temaseyî bi karanîna çarên xebata rêpêdayî di pêla siyasîyî rawestyayî û serdariya rêpêdayî Borcuwazî pir ew pesindikir, di salên 1877/1878 de, piştî derxistina Qanûnên sosyalistî⁵⁷, pir bi tuji "Pevikên sûresî" ê wek Most gunehbar dikir, her wehaji bi wê xurtbûnê, eger neji hêjî bêtir, xwe wî zivirand berê xwe da ser Kêsperestyê, a xwe di wê çaxê de demekw dirêj partiya sosyalistîyî demokratîyî resmî xistibûn destên xwe, a nizanibû bê çawa xweser-sorbûn û mêrxasîyê, rawestandina sûresî û xwe karxistinê derxine, nala bersevekê li ser qanûna Jirêderketî ku ew têkeve xebata veşartî. (name guheztin ên Marx û Engels, Danîna IV, R. 397, 404, 418, 422, 424⁵⁸); her wisajî biner li nameyên ji bona Sorge.)

Hatiye nivîsandin di Julî - November 1914. de.

Pêşî di Ferhenga Granat, capa 7, Danîna 28 de hatiye belavkirin.

Navli bin nivîsandin: W. Iljin.

Lenin: Danîna, capa Elemanî, a 21, R. 31-68

R Û N I R I N

- 1) W.I. Lenin di buhara sala 1914 de dest bi gotara "Karl Marx" ji bona Ferhenga Granat li Poronin (Galizien) pêkir û ew di novembara 1914 de li Bern (Swîsra) anî dawî kirin. Di pêşgotina sala 1918 de a vî karî de, Lenin ji bona nivîsandina vî karî li gora bîra wî sala 1913 dide. Di ferhengê de ev karê han bi fehresta wêjeyan l gel di sala 1915 di bin navê W. Iljin hate belavkirin. Ji ber sebeba Zenzûr (çavdêryê) Serperestiyê du derî çapnekirin - "Sosyalistî" - û "Taktîka xebata çîniyî Pirolitari" - her wehaji bi pir guhertin di kar de kirin. Xaniyê çapa "Priboi" di sala 1918 de ev karaya bi pêşgotinekê li nik Lenin mîna pirtûkekê, bi xwe jî wisa, mîna ku ew di ferhengê de hatûbû derketin, lê belê bê "fehresta wêjeyan". Ev karaya bi careke mîna destnivîsandina xwe a pêşî di sala 1925 de di danîna civandî de "Marx, Engels Marxistî" de hate belavkirin, li bal Instityûta Lenin a Komitiya Nawendî a KPR(B). 38
- 2) Bi ner li Danînên Karl Marx/Engels, Danîna 29, R. 47.
- 3) HEGELYÊN ÇEP yanjî HEGELÊN XORT - Wênerên perê çep ên dibustana Hegelî - Şapekî felsefiyî idialistî li Elemanya.
- 4) Bi ner li Friedrich Engels: Ludwig Feuerbach û dawîya felsefa kilasikiyî Elmanî. Di Danîna Karl Marx/Friedrich Engels, Danîna 21, R. 272 de.
- 5) "Rheinische Zeitung, ji bona siyasetê, bazirganyê û Destkaryê" - Rojnameyek rojnebû, ji 1. Yenayer 1842 de tanî 31. Adarê 1843 de li Köln derdiket.
- 6) Di dawîya gotara "Karl Marx" fehresteke wejeyên dûr û dirêj pêre hatî bû dan, ku ew di vê çapa han de nehatiye çapkirin. (Biner li Danînên Lenin, Danîna 21, R. 69-80.)
- 7) Evaya li ser gotareke Marx: Xwe bêrîkirina Nivîspêwendîvanê ji Mosel. (Biner Karl Marx/Friedrich Engels: Danînan I. R. 172-199.)
- 8) Nêt li ser "Deutsch-Französischen Jahrbücher" (Nivîstokên salane ên Elmani-yî - Frensf), ên di bin serperestîya Karl Marx û Arnold Ruge bi Elemanî li Paris dihatin derxistin. Bes bi tenha derketina wêyî pêşî a ducarî di febre-yera sala 1844 de. Sebeba bingehî a rawestandina kovarê, ew bîr a baweriyên cudayî yî bingehî di navbera Marx û Radikalê Borcuwazî Ruge de bûn.
- 9) Nête li ser derxistina bîr û bawerîya Marx di karê wî de "Li ser rexnegirtina felsefa mafe li nik Hegel". (Biner Karl Marx/Friedrich Engels: Danînan wan, Danîna I, R. 385.)
- 10) "KOMA KOMONISTAN" - Partiya Marxistiyî pêşî a Pirolitarya Cîhanî û Elmanî, di havîna 1847 de li Lodon di Konferensê "Koma Dadvanan" de hate danîna, a li wêdere hate duhertin bû "Koma Komonistan". Rêberên "Koma Komonistan Marx û Engels bûn, ên li ser dawwaza vê birêxistinê "Manifêsta Partiya Komnîst" nivî

sandin."Koma Komonistan" tanf 1852 de ma.Li ser mêjuwa wê biner li gotara F.Engels" liser mêjuwa Koma Komonistan"(Karl Marx/Friedrich Engels:Danfın wan,Danfına 8,R.577-594).

- (4)
- 11) "Neue Rheinische Zeitung"(Rojnama raynî nuh)- Ji 1.Junî 1848 tanf 19.Gulana 1849 li Köln di bin rêberiya Karl Marx û Friedrich Engels de derdiket. Sêfê serpereştiya wê Marx bû.
 - 12) Nêta Lenin gotara Marxîsfexneyî devavêti aku nivîsand"Herr Vogt"(Mirza Vogt) mîna bersevekê li putûkekê tev buxtan derew a ku Peyayê Bonapartî Karl Vogt di bin navê "Mein Prozeß gegen die Allgemeine Zeitung"(Giliyê min li ser Allgemeine Zeitung) derxisti bû.(Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 14,R.381-686)
 - 13)Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 2,R.132.
 - 14)Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 23,R.27
 - 15)Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 20,R.41,55
 - 16)Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 21,R.274/275
 - 17)Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 32,R.229
 - 18)Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 20,R.106,her wehaji li xwarê Lenin ji wê danfînê careke din werdigre di nivîsîne,R.10 û 22
 - 19)Biner Friedrich Engels: Ludwig Feuer bach.... di:Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 21,R.267/268 û 293
 - 20) Biner Friedrich Engels:Anti-Dühring,di:Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels, danfına 20,R.24
 - 21) Biner li Name guheztinan,"I",Danfına IV,Karl Marx/Friedrich Engels,Berlin 1950,R.8
 - 22)Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 21,R.280/281
 - 23)Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 23,R.393
 - 24) Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına13,R.8/9
 - 25) Biner li danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına31,R.234
 - 26) Biner li danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 4,R.462/463,her wehaji li xwar R.472
 - 27) Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına23,R.15/16,her wehaji li xwar R.88
 - 28) Biner li Karl Marx/Friedrich Engels,li Danfînên,danfına 13,R.18 di Nivîstoka Karl Marx de:Li ser rexneyê aburiya siyasî.
 - 29) Biner li Danfînên Karl Marx /Friedrich Engels,danfına 23,R.184,her wehaji li xwar li R.181 û 790/791
 - 30) Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 30,R.263 tanf 268 û 274/275
 - 31) Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 25,R.807
 - 32) Biner li Danfînên Karl Marx/Friedrich Engels,danfına 23,R.775,her wehaji li xwar li R.671/672

- 33) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 7 ,R.84
- 34) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 8 ,R.201
- 35) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna7 ,R.84
- 36) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna25,R.814/815
- 37) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 23,R.529/530
her wehajî li xware li R.514 û 507/508
- 38) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 4 ,R.479
- 39) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna21 ,R.166/167.Herwehajî
li xwarê li R.168
- 40) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna20 ,R.262
- 41) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 22,R.499 li nik
Engels li ser:Pirsiyariya Cotkaran li Firensa û Elemanya
- 42) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 30,R.342
- X 43) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 4,R.180
- 44) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 27,R.180
- 45) Biner li danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 29,R.231
- 46) CHARTIST- Havlbendên Chartisyê ne,ên tevgera sûresî a Karkerên Ingilî-
zî di salên 1836 tanî 1848 de,ên ji bona bi cihanîna Pirograma Gel xebat
dikirin û daxwaza wan bes bi tenha bû ji bona Demokratîkirina Ingilistanê.
. Li ser giringbûna Chartîstan Lenin dibêje:"Ingilistanê Chartîstî peş-
keskir ji bona dunyayê,tevgera Pirolitariyî sûresîyî pêşî ku firehbû,bi rastî
tevaya komên Xelkê girtibû f di warê siyasî de eskere û diyarbû".(Biner li
Danfnên Lenin,danfna 29,R.298)
- 47) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich,danfna 30,R. 338,342;Danfna 31,R.198
- 48) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna IV ji Name guheztinên wan
Berlin 1950,R.291 û 609
- 49) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 4 ,R.492
- 50) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels ,danfna 6,R.108/109
- 51) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 31,R.68
- 52) Biner li Danfnên Karl Marx/ Friedrich Engels,danfna29,R.47
- 53) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 31,R.46 û 55
- X 54) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 30,R.354,357/358,
374/375,429;Danfna 31,R.37/38,45/46,52-54,371,402 û 412
- 55) Biner li Danfnên Karl Marx/Friedrich Engels,danfna 17,R. 277
- 56) Biner li Danfnên Karl Marx/riedrich Engels,danfna 33,R.205/206
- 57) QANÛNA JI RÊ DERKETI DIJI SOSYALISTIYAN bi kurtî bi navê qanûna sosyalîs-
tan hate navkirin,a li Elemanya di sala 1878 de hate derketin.Li gora
vê qanûnê tevaya sazmandiyên partiya sosyal demokrat,hemû sazmandiyên
komên Xelkê ên Karkeran û çapemenyê rojnametyê bi derbekê hatin qedexekirin,
tevaya wêjeya sosyalîstî û nivîstokên li ser hatin civandin û jêsitandin û

dijf Sosyaldemokratan destbi zordarf û givastina wan hate kirin. Di bin givastin û xebata tevgera Komên Karkeran de qanûna ji rê derketi hate hilanin.

58) Biner li Karl Marx/Friedrich Engels: Name guheztin, danfina IV, R. 552/553, 581, 590/591 û 592/593

+++++

Min di wergerandinê de ji van çapana sêd wergirtiye, nemaze ji a Elemanî

1. L E N I N , Drei quellen û drei Bestandteile des Marxismus, Dietz Verlag Berlin 1970 (bi Elmanî)
2. L E N I N , Mesadir almarkisiye alselase we aqsamiha al mukewene al selase Dar alteqedum, Mosko (bi Erebf)
3. L E N I N , Karl Marx and his Teachings, Progress Publishers, Moscow
Hemû ew Danfinên di rûnkirinê de hatine tev de bi zimanê Elmanî ne.

+++++

N A V I K

Pêsgotina Wergêr	I
Sê kanf û sê pêkhatinên Marxistiyê	1
I	1
II	2
III	4
Karl Marx (bi kurtî li ser mêjuwa Marx li gel daxuyanî kirinekê li ser Marxistiyê	6
Pêsgotin	6
Rêya Marx	10
Metêryalistiya Felsefî	10
Diyaliktik	12
Têgihistina metêryalistiyî mêjuyî	13
Xebata Çînî	15
Rêya Marxî Aburî	17
Hêjabûn	17
Hêjabûna Bêtir	18
Sosyalistî	25
Taktika Xebata Piroletariyî Çînî	28
Rûnikirin	23